Universität Bremen

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“

III.2.B. Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê û Serpêhatiya wê ya Xuyakirinê

Münevver Azizoğlu Bazan

Îlon 2017

blickwechsel
Studien zur zeitgenössischen Türkei
Ein Programm der Stiftung Mercator

III.2.B. Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê û Serpêhatiya wê ya Xuyakirinê

Ev nivîs di çarçoveya lêkolîna ku tevgerên jinan ên li Tirkiyê û Tevgera Jinên Kurd li bajêr û heremên cuda bi awayekî berhevdan dide dest, de hate nivîsandin. Ji ber vê sedemê ev nivîs ji hêlekê de têgihiştinên tevgerên jinan ên li welêt ên di derbarê Tevgera Jinên Kurd de – û berevajiyê ve – dê bigre dest û ji hêla din de dê xalên bi hev re û ji hev cuda tên dest girtin, binirxîne.

Di beşa raporê ya bi navê „Mînakên Tevgerên Jinan ên ji Qadên Lêkolînê“[1] de, di çarçoveya nirxandina tevgerên jinan de „Tevgera Jinên Kurd“ jî di bin vê pênaseyê de tê bi nav kirin. Bi giranî hevpeyvîner Tevgera Jinên Kurd wek aktoreke pêwîst li Tirkiyê dinirxînin. Ev tevger di nav hevpeyvînan de di mijarên wek ‚civaka zayendî‘, ‚pirsgirêka Kurd‘, ‚nêrîna siyasî‘, ‚sekna bîrdozî‘ û hwd. de him ji *derveyî* rêxistinê û him jî ji *hundir* de bi gelek awayan tê şîrove kirin.

Di vê nivîsê de dê destpêkê serpêhatiya xuyakirina „Tevgera Jinên Kurd“ di nav „Tevgerên Jinên Tirkiyê“ de bê dest girtin, dû re di çarçoveya lêkolînê de mijarên ku Tevgera Jinên Kurd digire dest û şîroveyên vê derbarê de –ji *derve* û ji *hundir* de- bên nirxandin. Di dawiyê de xalên ku Tevgera Jinên Kurd û tevgerên jinên din ên Tirkiyê ji hev cuda dikin û digihînin hevdû dê bên dest girtin û bandora vê yekê li ser xebat û çalakiyên wan bê analize kirin.

1.1 Pêvajoya Dîrokî

Rêxistinbuyîna jinên Kurd di dema komarê de li Tirkiyê û Kurdîstanê[2] heta salên 1970’an diçe. Piştî darbeya leşkerî ya sala 1980’an bi taybetî li metropolên Tirkîyê komên jinên Kurd, kovarên jinên Kurd û derdorên ku xwe ji „partiyên sîyasî, femînîstên Tirkîyê û ji mêran serbixwe“ rêxistin dikin, derdikevin holê. Li ser rêxistinên jinên Kurd ên ku ji sala 1990’an şûn de zêdetir bi daxwazên siyasî derketine holê, bandorên serhildanên Kurdistana Tirkiyê, koçberiya metropolan û bi awayekî aktîf tevlîbûna nav Tevgera Kurd gelek mezin in (Açık

[1] Ji bo agahiya berfirehtir, li nivîsa III.2.A. „Mînakên Tevgerên Jinan ji Qadên lêkolînê“ (Polatdemir 2017) binerin.
[2] Pêyva Kurdistanê tê wateya „welatê Kurdan“ û bi vê peyvê welatekî ku bi sînoran hatiye xêz kirin û serdest e, nayê fêm kirin. Kurd ji hezar salan vir de ye gelekî ku li herema Mezopotamyayê-li Asyaya Pêşîn- bi cîh bûne, niştecihê vê derê ne û ji hezar salan vir de ye peyva Kurdistanê tê bikaranîn. (Strohmeier/Yalçın-Heckmann 2000:20).

2003:134-136).

Ji salên 1990’î şûn de rêxistinbuyîna jinên Kurd – mina komel, kom an jî derdorên kovaran – dikare li ser du esasan bê nirxandin. Gruba yekemîn komên feminînîst ên jinên Kurd, ku xwe ji derveyî partî û sazîyan rêxistin kirine, ya duyemîn jî saziyên jinên Kurd, ên ku bi Tevgera Kurd re beramber pêş ketine. Komên femînîst ên Kurd ên „serbixwe“ zêdetirî kar û xebatên xwe li Stenbolê meşandine (minak Koma Jinên Kurd ên Serbixwe-1990), heta dawiya salên 1990’an bi kovaran (Roza, Jûjîn, Jîn u Jiyan, hwd.) hebûna xwe parastine. Rêxistinên jinan ên ku bi tevgera Kurd re rastehev (paralel) pêş ketine, taybetî bi xebatên xwe yên li Stenbolê gihîştine nasnameyeke fermî. (minak Komeleya Jinên Welatparez a ku di sala 1991’an li Stenbolê hat damezirandin). Lê mixabîn ev sazî di encema pêkutiyên dewletê her tim hatine qedexe kirin û bi naveke din li Stenbolê an jî li bajereke din xebatên xwe domandine (Açık 2003: 135 ff.; Aktaş 2015: 2).

Bi taybetî dema Serhildanan (Strohmeier/Yalçin-Heckman 2000; Açık 2003; Çağlayan 2007), ku di salên 1990’an de bi pêşengtiya jinan li bajarên Kurdan pêş ket, di rêxistinbuyîna jinan de roleke sereke dilîze. Hemû lêkolînên li ser jinên Kurd hatine çêkirin, girîngiya dema serhildanan tînin zimên. Di hevpeyvîna xwe da aktîvîsta Kongreya Jinên Azad KJA’yê û di heman demî de (di dema lêkolînê de) berdevka Kongreya Jinên Azad Sara Aktaş, di serekebuyîna jinên Kurd de rola serhildanan bi awayekî berfireh tîne zimên:

> […] him bexwedanên zîndanan, him pevajoya serhildanan a ku berî salên 1990’î destpê kir û di salên 1990’an de xurtir berdewam kir, disa di salên 1990’an de asta tevlîbuna jinên Kurd a nav tekoşînê, [ev pêvajo hemî] rola jinan a di nav tekoşîna azadiyê de wek hêzekî bingehîn, sereke û pêşeng derxistin holê [...]. (Aktaş 2015: 2).[3]

Bi tevlîbûna dayikên Kurdan[4] a nav pêvajoyê, yên li ber deriyê zindanan li hevîya zarokên xwe

[3] „O açıdan hem 80' lerdeki cezaevi direnişleri, hem 90' lara gelirken başlayan ve 90' larda ivme kazanarak devam eden serhildan süreçleri [...], yine özgürlük mücadelesine Kürt kadınlarının katılım düzeyi beraberinde şunu getirdi: 90' larla birlikte aslında Kürt kadınlarının özgürlük mücadelesinde çok önemli bir figür olarak, bir dinamik olarak, bir temel öncü güç olarak öne çıkmasını besleyen süreçler oldu [...].“

[4] Ji bo analîza kesayeten jinên Kurd binerin: Çağlayan (2007), Yalçın-Heckmann (1999).

bûn, yên ku zarokên xwe di pevçûnan de wenda kiribûn, taybetiya Tevgera Jinên Kurd di alîye girseyî de derxistin hole. Li alîyê din zêdebûna hejmara şervanên jin a di nava „Tevgera Kurd“ – di sala 1994’an de behsa 2000 şervanên jin tê kirin – (Açık 2003: 144) û herweha ji HADEPê (Partîya Demokrasîya Gel) vir de bi avawekî aktîf cîhgirtina jinên Kurd a di nav partîyan – ku „mijara Kurd“ ji xwe re wekî mijarekî esasî digirin – de, bû sedem ku mijara jin di demekî zû de di program û xebatên wan de ji xwe re cîh dît. Bi demê re her çiqas hêzên jinan bi awayekî xurt werin temsil kirin jî, di hemû qadan de, taybetî di nav partiyên siyasî û xebatên rêxistinkirinê de hebûna nezikatiyên baviksalar, berdevama rolên civaka zayendperest, Tevgera Jinên Kurd a li Tirkîyê xist nav analizên berfireh. Ji sala 1993’an şûn de, ji bo ku jin di alîyê leşkerî û polîtîk de zane û bi xwe bawer bibe, derbasbuyîna sistemekî otonom, ku tê de ji sisteme, malbat û zilamê qutbuyînê[5] bi xwe re tîne, esas girt.[6]

1.2 Azmûna Tevgerên Jinan û yên Femînîst ên li Tirkiyê bi Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê re

Yekemîn tekîliyên rêxistinî yên jinên Kurd ên di nav Tevgera Jinên Kurd li Tirkiyê û rêxistinên femînîst ên Tirkîyê di destpeka 2000’an de bi „Projeyên cem-hev-anîna jinan“ ku bi peşengîya *Amargi*yê tên organize kirin, gengaz dibe.[7]

Di van hevdîtinan de femînîstên Tirkîyê pirsgirêkên xwe yên bi jinên Kurd û femînîstên din re nirxandin û peşketinên nav dînamîken femînîzmê wek çavkanîya pirsgirêkan a li Tirkîyê analiz kirîn (Al-Rebholz 2012: 262). Nêzikatiya femînîstên Tirkîyê, ku polîtîkaya femînîzmê bi hevbeşkirina pirsgirêkên jinan ve bi sînor dike; lewre jî ji daxwaza jinên Kurd ên di derbarê nasnameyên etnîk de aciz dibin (Al-Rebholz 2012: 263). Rexneya derbarê daxwazên ji bo bidestxistina nasnameyên netewî, desthilatdariyên ku xwe li ser civaka zayendperest ava dikin, paş çav dike, hîn jî di rojevê de cihe xwe digire. Femînîstên Kurd karektera femînîst a

[5] Teorîya Qutbuyînê: Tevgera Jinên Kurd, têzên Abdullah Öcalan ên di derbarê civaka Kurd ji bo bingeha teori û bîrdoziya xwe û herweha pêşketina xwe esas digire.
[6] Femînîzm Analîz dike û dibêje tevgerên “etnik” di nav pevajoyê de bi civaka zayendperest re tên hemberî hev (Yalçın-Heckman, 1999).
[7] Hevcivînên Amargiyê: Hevcivînên Jinan ên li Diyarbekir, Batman û Stenbolê (2001) , Jin ber bi hev ve dimeşin (2002), Em rizgarî ya xwe bi rêxistin bikin 2002), Di Tevgera Jinan de azmûnên tekoşînê (2002-2003).

sereka ya Tirkiyê wek elît û nijadperest binav dikin û dibêjin ev taybetiya wan nahêle ciherengiyê bipejirînin. Ligel vê yekê Anil Al-Rebholz (Al-Rebholz 2012: 264) di lekolîna xwe de behsa lêgerînên femînîst ku hin di sala 1990’an de pirsa „ligel cudabuyînên xwe jî gelo em nikarin polîtîkayeke hevbeş derxînin holê û piştgiriya hevdû bikin?“ dikin, dike. Ji sala 1990’an vir de bi zêdebûna sazî û rêxistinên jinan ên ku xwe ji hêla bîrdozî, etnîk û çandî de cuda cuda bi nav dikin, tevgera femînîst neçarî dîtîna xwe guhartinê dibe (Al-Rebholz 2012: 219). Rewşa (bê)tekîlîbûna demdirêj a di navbera tevgerên jinên Tirkiyê û/an jî femînîst a bi Tevgera Jinên Kurd re di hevpeyvînên lekolînê de jî bû mijar.

Dema Handan Çağlayan balê dikşîne ser tevlîbûna polîtîk û tekoşîna Tevgera Jinên Kurd ku di salên 2000’an de tê xuya kirin (Çağlayan 2014: 20), ji Koalisyona Jinan Ilknur Üstün vê pêvajoyê wek pêvajoyekî ku Tevgera Jinên Kurd navber dixe nava xwe û tevgera femînîst binav dike.

> […] Dema […] sala 2000’an, an jî berî 2000’an tevgera femînîst [û] Tevgera Jinên Kurd ji hev gelek sûdê werdigirtin, […] neha jî ligel awayekî piştgiriyê […] dîsa jî [Tevgera Jinên Kurd] xwe ji tevgera femînîst bi awayekî net cuda dinirxîne . Ev di rastiyê de tiştekî girîng e. (Üstün 2014: 48).[8]

Li gorî xebata Al-Rebholz, ku li jorê behsa wê tê kirin, tevgera femînîst jinên Kurd û tevgera wê wek tevgerekî femînîst nabîne û li ser vê esasê nagire dest; jinên Kurd weke muxatab nabîne û daxwaza wan nagire ber çav; ev rewş bi sekna tevgera femînîst ve tê giredan. Lê ligel vê di lêkolîna me de beşdarvan ligel daxwaza bihevre meşandinê nepejirandina Tevgera Jinên Kurd a li Tirkîyê weke tevgerekê femînîst, li ser pozîsyona Tevgera Jinên Kurd didin dest nîşan kirin (Üstün 2014: 48).

Ji salên 1990’an şûn de hêza Tevgera Jinên Kurd xurt dibe û di qada polîtîk de dibe wek kirde, xuya dike. Bi vî awayî Tevgera Jinên Kurd zêdetir tê xuya kirin û dibe hezekê ku muxatap tê girtin. Li gorî Al-Rebholz tevgera femînîst a li Tirkiyê heta salên 2000’an ne di asta ramanî, ne jî di asta tevger de Jinên Kurd nabîne. Lê piştî salên 2000’î di asta îdeolojîk de hewldanên

[8] “[…] Çünkü […] 2000’lerde ya da 2000 öncesinde feminist hareketler [ve] Kürt Kadın Hareketi birbirinden çok beslenir […]. Şimdi de bir tür dayanışma […] olmasına rağmen, […] yine de [Kürt Kadın Hareketinin] kendilerini feminizmden net bir biçimde farkını koyarak tanımlamaları aslında önemli bir şey.”

nezikbûnê hene (Al-Rebholz 2012: 264). Tevgera Jinên Kurd a Tirkiyê bi xurtbuna hêza xwe ya rêxistinî di salên 1990’an şûn de ket rojeva tevgera femînîst. Li gorî tespîten Aksu Bora (Al-Rebholz 2012: 264-265) ji bo ku mercên Tevgera Jinên Kurd a Tirkiyê û tevgera femînîst nêzî hev bibin û danûstendin navbera wan de çê bibe, divê tevgera femînîst bi dîtînên xwe yên nijedperest û paradîgmaya xwe ya kemalîst re hesabê bibîne. Li gorî Aksu Bora bi pêjirandina cudahiyê di navbera jinên Kurd û femînîstên Tirkiyê de têkilî nikare were sazî kirin. Ev têkilî tenê bi riya hesapdayîna femînîstan a di nav xwe de dikare bê sazî kirin.

Jinên Kurd bi taybetî li dijî imaja jinên Kurd a „gundî, paşketî, nezan, reben“(Sancar 2014: 34; Alataş 2015: 38; Güngör 2015: 30) ku di nava tevgera femînîst a li Tirkiyê de wekî nezîkatîyeke sereke pêş keti bû, gelek rexne dikin. Femînîzm bi karektera xwe ya elît û serdest jinên Kurd nabîne. Lê nedîtina jinên Kurd bi gotina Spivak (1988, 2008) ji xeynî nedîtina kesên mexdûr, xwedî karaktereke din e. Lewre li vir li ser navê Jina Kurd a mexdûr[9] axaftin, an jî wê temsil kirin tune ye. Ligel vê rêxistinbûna jinên Kurd a ji tevgera femînîst a Tirk serbixwe wekî ku Crehan tîne ziman (2002) ev yek bi rîya redkirinê pêşxistina zanebûna xwe parastinê ye. Di lekolîna me de beşdarvanên akademîsyen û aktîvîst balê dikşînin ser girîngiya rexneyên Tevgera Jinên Kurd a li hemberî tevgera femînîst a Tirkiyê û hesab dîtina wê. Serpîl Sancar, ku bilî nasnameya xwe ya Seroka Navenda Lekolîn û Pêkanîna Pirsgirekên Jinan a Zanîngeha Enqerê (KASAUM) û bi xebatên xwe yên li Komeleya Raçavkirina Wekhevîya Zayendan (CEİD) tevlî lekolîne bû, girîngiya rexneyên ku cemeda navbera tekîlîyên jinên Kurd û femînîstan heland, tîne ziman. Sancar jî mîna Aksu Bora van rexneyan wek sedema hesap dîtina navxweyî ya femînîstan li Tirkiyê dinirxîne:

> Rexneyên Tevgera Jinên Kurd di vî mijarî de, – ango nûjenbuyîna Tirkiyê tenê li ser esasa Tirkbûnê ye. Kesen ne Tirk, ên wek jinên gundî, rojhilatî, jinên kêm xwendî ji derve dihêle – rexneyeke gelek di cîhe xwe de û girîng bû. Ev rexne di rastiyê de zedetirî ku navbera Kurdan û femînîstan vebike, navbera femînîst û Kemalîstan vekir. Femînîst […] ji gotinen [wek],mafên jinan ên Kemalîzma nûjen‘ ku ji salên 1920 û 30’an vir de tên bikaranîn bi lez dûr

[9] Spivak pêyva mexdûr (madun) ji Gramsci digire. Di teoriya postkolonyal de têgeha ‘madûn (subaltern) di hêla civakî de ji bo komên marjînalîze bûne, tê bikar anîn.

> kêtin û xwe nêzî Tevgera Jinên Kurd kirin. (Sancar 2014: 34)[10]

Mukaddes Alataşa ji Navenda Jinan a Kardelenê ya bajarê Diyarbekirê jî di wê dîtine de ye ku pêşdaraziyên ku Sancar tîne ziman, bi hindikayî be jî kêm bûne:

> […] em neha bi tevgera jinên Tirkiyê re pir ten cem hev. Berê bi awayekî cuda li me dinertin. „PKK'yî, terorîst“,[…] ango me wisa [wek] bêteşe, tu tişt nezan, – medya dewlet, sîstem Kurdan çawa digire dest, bi wî awayî li me dinertin. Ev nêzikatî hinek hat şikandin. […] Wan jî di pratîkê de dît ku ku vê hêza rêxistinî pir tiştan ava dike. (Alataş 2015: 38)[11]

Ozlem Şahin Güngör, ku ji xeynî nasnameya xwe ya akademîsyen wek aktîvîsteke Komeleya Jinan a Karyayê ya bajarê Muğlayê tevlî lêkolîna me bû, anî ziman ku di guhartina nezikatîyên di nav femînîstên Tirkîyê ya li hemberî jinên Kurd de bandora xurtbûn û bilindbûna Tevgera Azadîya Kurd heye. Lê li gorî wê hîn jî nezikatîya li hember jinên Kurd xalekî şikêstinê pêk tîne:

> [ya] duyemîn „meseleya Kurd“ e. Kesên ku li derdora tewera yekemîn [kesên Laîk] ku min anî bû ziman kom bûne, li vir bi civak bûne û vê têgihiştina polîtîk diparêzin, jinên Kurd „wekî reben, divê bên rizgar kirin, di destê kevneşopiyan de bi kuştina toreyan ve mijûl dibin“ didîtin. […] Ango dema ez tevgera salên 1980'an, destpêka 1990'an, têkiliyên heremî, têkiliyên zayenda civakî û yên îro tînim ber hev, [jin] guhartineke gelek mezin pêk anîne. Rexisteneke jinan a pir mezin pir bi lez çêbû û pevajoyeke ku jin pir xurt kirin hat jiyan kirin. Her çiqas vê rastîyê bibînin jî, sinorên polîtîk û yên îdeolojîk ên di serê wan de nahêle ku li ser esasa jintiyê bi wan re tekîlîyekê deynin. (Şahin Güngör 2015: 30)[12]

---

[10] „Kürt Kadın Hareketi'nin bu konudaki eleştirileri - yani Türk modernleşmeci perspektifinin çok Türk odaklı olduğu, Türk olmayanların dışlandığı, hani köylü, Doğulu kadının, daha az eğitimli kadının dışlandığına yönelik eleştirisi çok önemli bir eleştiri oldu. Kürtlerle feministlerin arasını açmaktan çok feministlerle Kemalistlerin arasını açtı aslında. Feministler […] 1920'lerden 30'lardan gelen bu ‘modernleşmeci Kemalist kadın hakları’ söyleminden daha hızla koparak Kürt Kadın Hareketi'ne daha yakın durmaya başladılar.“

[11] „[…] Şimdi biz Türkiyeli kadın hareketleri ile çok sık bir araya geliyoruz, daha önce bize çok şey bakıyorlardı: ‚PKK'lı, ‚terörist‘. […] Yani bizi işte böyle […] çok kaba, hiçbir şey bilmeyen – medya, devlet, sistem, Kürt'leri nasıl tanıttıysa- öyle algılıyorlardı. Bu algı kısmen yıkıldı. […] Bu örgütlü gücün çok şey yarattığını, pratikte gördüler.“

[12] „[…] ikincisi ‚Kürt meselesi‘. Bu söylediğim birinci eksenin [Laik kesim kastediliyor] etrafında sıralanmış, burada sosyalleşmiş olan, bu politik bilince sahip olanlar, […] Kürt kadınlarına önce ‚zavallı, kurtarılması gereken,

Lale Yalçın-Heckman (1999) di gotara xwe ya etnografîk de ku tê de îmaja jinên Kurd dinirxîne, tîne ziman ku pêvajoyên şer[13] li ser „em“ û „yên din“, nasnameya „Tirk“ û „Kurd“ de gotin û teswîrên gelemperî yên nû derdixînin holê. Di vê pevajoyê de îmaja jinên Kurd, nezikatiya baviksalarî, cihê wê yê di nav malbatê û civakê tê pirsyarî kirin. Tespîtên Yalçın-Heckman, ên ku di nav civaka Kurd de li ser esasa tekoşîna netewî guhartina imaja jinên Kurd digire dest, di çarçoveya lekolîna me de jî ji bo nezikatîyên ji derve (*Fremdbeschreibung*) yên li ser îmaja jinên Kurd dikare were şîrove kirin. Di vir de pewîst e ku bê ziman, di guhartina têgîhiştina heyî ya derbarê Jinên Kurd de rola dinamîka guhartina navxweyî ya jinên Kurd gelek mezin e.

1.3 „Em“ û „Ew“

Di çarçoveya mînakên li jêr tê dîtin de, divê di destpêkê pêyvên „em“ û „ew“ ên ku beşdarvan di gotinên xwe de tînin ziman, ben destgirtin, da ku bê fêm kirin ev peyv di kîjan wateyê de hatine bikaranîn. Di hevpeyvînan de hat dîtin ku beşdarvan bi piranî ji bo kesên ji derveyî pozîsyon û saziyê xwe peyva „ew“ bi kar tînin. Ev yek bi Tevgera Jinên Kurd re ne bi sînor kiriye. Hemû beşdarvan ji bo danasîna kesên derveyî xwe, di vegotinên xwe de – piranî bi riya berhevanîna taybetîyên hev – têgehan cuda bikar tînin.

Beşdarvan û Aktîvîsta ku ji Herema Egeyê tevlî lekolîna me bû, yek ji wan kesan e ku di hevpeyvîna xwe de vê yekê bi cewherî tîne ziman:

> […] Parçebûnekê din jî [heye]: Nêzikatiya „em û ew“ […]mexdûr, reben. Minak ev Kurd, mexdûrê koça bi zorê ye. Di nezikbûna Jinên Kurd de [jî wek], „ziman jî nizanin, belengazên ku negihîştine derfetên xwendine“, […] heye. […] Gelek komelên [bi vê nezikatiyê] hene û ev dema xebat dimeşînin [wek minak dibêjin] „me jinên xwe birin sînemayê“ „jinên me […] vê tiştî kirin.“

---

geleneksel değerler içerisinde töre cinayetleri ile uğraşan kadınlar‘ gözüyle bakıyorlardı. […] Yani 1980'i yılların, 90'ların başındaki hareket[l]e ve bölgedeki ilişkileri, toplumsal cinsiyet ilişkileri ile şimdikini karşılaştırdığımda, [kadınlar] müthiş bir dönüşüm yarattı. Çok büyük hızlı bir kadın örgütlenmesi ve kadınları çok güçlendiren bir süreç yaşandı. Bunu görüp teslim etmelerine rağmen kendi kafalarındaki ideolojik politik sınırlar, onlarla daha kadınlık sorunları üzerinden ilişki kurmalarını engelliyor.“

[13] Li vir behsa şerê navbera PKK û hêzên ewlekariyê, ku ji salên 1984’an vir de bi tekoşîna çekdarî dest pê kiriye, tê kirin.

> Ango [...] ev ne tiştekî xirab e. Bê guman karê ku dikin bi kêfxweşî dimeşînin, lê belê nêzikatiyeke weha „em jinên serfiraz“ û [ew] „jinên bindest û qurban“ hin jî heye. […] qet nebe ev yek di anîna ziman de heye. (Anonîm 2015: 31)[14]

Me dît ku bi vî awayî gelek beşdarvan di hevpevînên xwe de gotinên „em“ û „ew“ di çarçoveyên curbecur de bi kar anîne. Ji zanîngeha Enqerê Alev Özkazanç di nirxandina xwe de, ji du tevgeran behskirinê wek sedem di xwepênaseya Tevgera Jinên Kurd de dibîne:

> Belê em ji xwe re nabejin „Tevgera Jinên Tirk“, lê dema ew wek „Tevgera Jinên Kurd“ [bên binav kirin] û ew jî xwe wek „Tevgera Jinên Kurd“ bi nav dikin, wê demê em jî dibin tiştekî din. Têkîlîyên me yên bi wan re jî xurt e. (Özkazanç 2014: 29)[15]

Di tarîfkirina ji *derve* de Tevgera Jinên Kurd bi xebat, tekoşîn û tecrûbeyên xwe wek mînak tê nîşandan û emsal tê girtin. Ev yek bi şîroveyên tevlî „em û ew“ derdikevin pêş. Jineke aktîvist ku ji Kolektifa Sosyalîst Femînîst a ji bajarê Enqerê tevlî lekolîna me bû, vê mijarê weha tîne zimên: „[…] Em û jinên Kurd piştgiriya hev dikin, em dixwazin guh bidin gotinên wan û têkîlîya navbera tekoşîna wan û ya me xurt bikin.“ (Anonim 2014: 3)[16] Bi vî awayî balê dikişine ser „bi wan re“ tekoşîn meşandinê û berpirsiyariya ji bo „me“ derdixîne holê. Di heman demî de ji *Uçan Süpürge*yê ji bajarê Enqerê, Selen Doğan jî hînkirina pratîka tekoşînê ya li „wê derê“, bi vê dualîzmê îzah dike: „[…] Ango li wir zilam jî ji bo xurtbûn û azadbûna jinan herdem piştgiriya tekoşînê kirin. Ev pratîkeke gelek girîng e û wan ev yek bi me dan hîn kirin […].“ (Doğan 2014: 30)[17]

---

[14] „ […] Bir başka yarılma da [var] […]: ‚Bizler ve onlar algısı‘. […] kurbanlar, zavallı. Mesela bu Kürt, zorunlu göç mağduru. Kürt kadınları [na] yaklaşırken de, dil de bilmeyen, eğitim olanaklarına da ulaşamamış zavallılar. […] Bir sürü bu tarz [yaklaşımı olan] dernek var ve onlar mesela çalışmalar yürütürken işte ‚kadınlarımızı sinemaya götürdük, kadınlarımız […] şunu yaptılar‘ [diye anlatıyorlar] Yani bu […] kötü bir şey değil. Tabi ki yaptıkları işi severek yapıyorlar ama biraz böyle ‚biz, kurtarılmış kadınlar‘ ve ‚kurtarılamamış, kurban olmuş kadınlar‘ ayrımı bir miktar da var. […] En azından dilin kuruluş biçiminde.“

[15] „Biz kendimize ‚Türk Kadın Hareketi‘ demiyoruz tabii ama işte onları, ‚Kürt Kadın Hareketi‘ [diye tanımlayınca] ve onlar kendilerine ‚Kürt Kadın Hareketi‘ deyince işte biz de başka bir şey olmuş oluyoruz. Onlarla da ilişkilerimiz yoğun olmuştur.“

[16] „[…] Kürt kadınlarıyla dayanışıyoruz, onların seslerine kulak vermek, onların mücadelelerini yine bizim mücadelemizle bağlantılandırmak gibi bir derdimiz var.“

[17] „[…] Yani orada erkekler de kadınların özgürleşmesi, güçlenmesi için mücadeleye her zaman destek verdi. Bu çok önemli bir pratik ve onlar bize aslında bunu öğrettiler […].“

Di lêkolîna me de ramanên cuda taybetî di navbera tevger(ên) jinan, di pratîka çalakîyên cuda û di pirsên dîtinên li ser rojevê de nirxandinên bi „em“ û „ew“ derkêtin holê. Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê mijarên ligel jin û zayenda civakî, xwedî ajandayeke ku di tê de pirsgirêka Kurd, mafê mirovan, zimanê zikmakî, daxwazên hemwelatiyê, mafen çandî cihê xwe digirin, e. Ev yek dibe sedem ku di hinek xalan de bi tevgera jin re digîhijin hevdû û di hinek xalan de ji hev cuda dibin (Kapusuz-Kütküt 2014: 23; Arif û yên din: 2015: 16).

Yek ji encamên girîng ên lêkolîna me ew bû ku, Tevgera Jinên Kurd her çiqas daxwaziya xebat û tekoşîneke hevbeş bike jî, dîsa jî bi awayekî vekirî xwe ji tevgera jinên din ên li Tirkiyê cuda dibîne. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku aktîvîstên Tevgera Jinên Kurd li Tirkiyê bikaranîna pêyvên „em“ û „ew“ bi piranî di çarçoveya balkişandina ser cudabûna xwe bikar tînin.

Ev cudabûn zêdetir di hevpeyvînan de di çarçoveya ligel tevgerên jinan ên din li Tirkiyê xurtbûna Tevgera Jinên Kurd de tê bikaranîn „xwedî rêxistineke xurtirin e û dikare biryaran bi israr, bê tirs û zûtir pêk bîne.“ (Alataş 2015: 34; Aras 2015: 14; Zin&Emek 2015: 39) Di hevpêyvînan de derdikeve holê ku çalakvanên Tevgera Jinên Kurd pêyvên „em“ û „ew“ zêdetir bi aweyekî rexnegirî bikar tînin. Mînak dema ku Mukaddes Alataş ji Navenda Jinan a Kardelenê tekoşîna li hemberî Navenda pêşîlêgirtin û şopandina tundiyê ŞÖNİM'an (Şiddet Önleme ve İzleme Merkezleri) mînak dide, cudabûna xwe û yên tevgerên jinên Tirkiyê, ku wan wek „ew“ binav dike, bi gelek awayan şîrove dike:

> Ew nikaribûn vê yekê pêk bînin, çima nikaribûn, ji ber ku rêxistineke wan a heremî tune bû, [ger] rêxistinên heremî hebe [jî]; lê belê nikaribûn tekoşînê bidin. Ango li hemberî ŞÖNİM'an nikaribûn tekoşin, [tenê] rexne kirin […]. Lê belê me tekoşîn kir, hîn jî em li pey biryarên xwe ne.(Alataş 2015: 34)[18]

Dîsa ji Akademîya Jinan a Diyarbekirê Figen Aras dema ku behsa asta girseyîbûna tevgera jinan dike, nîqaşên nevbera wan û tevgerên jinên din ên li Tirkiyê dîsa bi dubendîya „em û

[18] „Onlar bunu yapamadılar, niye yapamadılar, çünkü onların bir yerel yönetimleri yoktu, […] yerel yönetimleri var [olsa bile], fakat mücadele edemediler. Yani ŞÖNİM' lere karşı mücadele edemediler, eleştirdiler […]. Biz ise mücadele ettik, hala aldığımız kararların arkasındayız.“

ew” tarif dike:

> Li ser vî esasî dema ku em bi wan re dikevin nîqaşê vê dibêjin: Hûn gelek tişten xweş difikirin û plansazî dikin, lê divê em xwedî îdîayekî ku vê yekê bi hemî jinan re pêk bînin, bin; ango em xwedî daxwazekî weha ne. (Aras 2014: 14)[19]

Di vê mijarê de xalekî balkêş jî ew e ku, çalakvanên Tevgera Jinên Kurd ên bajarê Diyarbekirê dema ku tevgerên jinan ên derveyî xwe dinirxînin, bi nêzikatîyeke gelemperî – total – pêyva „ew“ bikar tînin. Di alîye piraniyên çalakvanên Tevgera Jinên Kurd a bajarê Diyarbekirê de piralîbûna rêxistinî û ya ideolojîk a tevgerên jinên Tirkiyê nayê berçav girtin. Bi gelemperî gotina „Tevgera Jinan a Tirkiyê“ tê bikar anîn. Her çiqas sedemên cuda hebin jî, di çarçoveya mijara vê nivisê da mirov dikare taybetî pêkhatina hevpeyvînan li bajarê Diyarbekirê weke sedemeke nişan bide.

1.4 Etnîsîte: Faktoreke cudakir e?

Her çiqas mîna ku berê jî hatibû gotin ji aliyê beşdervanan ve tekoşîna Tevgera Jinên Kurd li Tirkiyê ji bo tevgerên jinên din ên li Tirkiyê weke mînakeke girîng û tecrube were dîtin jî, têgeha *„etnisite“*[20], mijara ku ji alîyê beşdarvanan ve yê herî zêdetir tê ziman e. Divê bê dest nişan kirin ku ev nîqaşên derbarê xalên ‚veqetandinê‘ ku giranî di çarçoveya mijarên Tevgera Jinên Kurd digirin dest de, tên nirxandin, bi giranî ji nêrînên beşdarvanan, ên ku ew di çalakî û civînan de şopandine û tecrube girtine, derketin holê. Tevgera Jinên Kurd di wê baweriyê de ye ku, hemu mijarên girêdayî bi jinan, nikare ji rastîya civakê û ji pêkhatîyan cuda bê dest girtin; ew di vê nêrînê de dikare rastî „xeta sor“ a „zîhnîyeta dewletê“ were. Di vir de faktora sereke ew e ku, her çiqas rola tevger an jî sazî û rêxistinên jinên dewletparêz an jî Kemalîst di nava tevahîya tevgerên jinan ên li Tirkiyê de ji alîye polîtîk an jî rojev tayînkirinê da ne mezin be jî, refleksên dewletparêzî di nava tevgerên jinan da gelek bi bandor in.

Mirov dikare bibêje rola „pirsgirêka Kurd“ a diyarker di nava beşa civakî û polîtîk a Tirkiyê de,

[19] „O yüzden de biz onlarla tartışırken şunu söylüyoruz: Çok güzel şeyler düşünüyorsunuz, planlıyorsunuz ama bunu bütün kadınlarla yapma iddiasına sahip olmak zorundayız, hani bizim böyle bir derdimiz var.“
[20] Ji bo agahîyên berfireh ên li ser „Etnîsîteyê“ di rapora lêkolînê de li nivîsa III.3.A. „Mijarên ku li Tirkîye tevgerên jinan ji hev cihê dikin û dikin yek“ binêrin (Polatdemir 2017).

di nava tevgerên jinan ên Tirkiyê de jî xwedî rolekî ber bi çav e. Çalakvanê platforma Piştgiriya bi Jinan a bajarê Denizlîyê vê pirsgirêka ku beşdarvanên hevpeyvînê di bin sernivîsen cuda cuda de digirin dest, bi awayekî gelemperî dinirxîne:

> […] „pirsgirêka Kurd“ damara herî mezin a vî welatî ye. […] Nêrîna li ser „pirsgirêka Kurd“ bi rastî jî di mijara jinê de jî xala cudabûnê diyar dike. (Anonim 2015: 90)[21]

Ji Komeleya Piştgiriya bi Namzetên Jin a bajarê Enqerê Hatice Kapusuz-Kütküta ku alîkarî dabû lêkolîna me, sînorên navbera tevgerên jin bi pêyva „xeta sor“ binav dike. Ev sînor di mijarên gelemperî de, wek mînak polîtîka, demokrasî û destûra bingehîn de (Kapusuz-Kütküt 2014: 23) derdikeve holê. Ew jî mina gelek beşdarvanan gotinê tîne ser xalên ku dibin sedema bi tevgera jinên Kurd re ketina dubendiyê: „[…] [mijara] xweseriyê ku ji nav ‚Tevgera Kurd‘ derketiye, [zimanê] Kurdî, ango tiştên ku mijarên mafê mirovan in, dibin sedema dubendiyan.“ (Kapusuz-Kütküt 2014: 23)[22]

Serpîl Sancar (Sancar 2014: 34) „di mijarên şîdetê, şîdeta biheq – şîdeta neheq, dîsa daxwazên derbarê hemwelatiya wekhev, di pirsgirêka naskirina cudahiyên çandî […] de [behsa]xeta nakokîyê“[23] dike. Ji *Uçan Süpürge*ya ji Enqerê Selen Doğan behsa sedema di civînan de alozbuyîna vê mijarê dike:

> Di civîneke berfireh de ku tevgerên jinan tên cem hev rexisteneke jin rêxistina din bi nijedperestiyê tawanbar dike, ya din jî wê ji bo ku mafên jinên Kurd diparêze bi PKKyî bûnê tawanbar dike […]. (Doğan 2014: 38)[24]

Mijareke din a tengazariyê jî di çalakiyan de di mijarên bi Kurdî belavok xwendin, pankart vekirin, dirûşme avêtinê de derdikeve. Ji Yekîtiya Jinên Tirk a bajarê Enqerê Sema Kendirici

---

[21] „[…] ‚Kürt sorunu‘ bu ülkenin en büyük damarı. […] ‚Kürt sorununa‘ bakış açısı aslında kadın meselesinde de ayrışma noktasını oluşturuyor.“

[22] „[…] ‚Kürt hareketinin‘ içinden çıkan özerklik, Kürtçe yani insan haklarının konusu olan şeyler söz konusu olduğunda, bir kutuplaşma söz konusu oluyor.“

[23] „şiddet, haklı şiddet- haksız şiddet meselesi ve devlete karşı eşit vatandaşlık talepleriyle ilgili, kültürel farklarının tanınması meselesiyle ilgili bir […] çatışma hattından“

[24] „Kadın örgütlerinin bir araya geldiği geniş katılımlı bir toplantıda, bir kadın örgütü diğerini milliyetçilikle suçluyor, diğeri onu Kürt kadınların haklarını savunduğu için PKK' li olmakla suçluyor […].“

Uğurman di hevpeyvîna xwe de di çalakiyên kurtajê de, ku di rastiya xwe de hemî rêxistinên jinan li ser vê mijarê hevpar in, pankart û belavokên Kurdî çawa dibin pirsgirêk wek mînak nîşan dide:

> […] berî sê salan di derbarê kurtajê de gelek nîqaş derketin, disa li wir[…] di destê me de afîş [hene] li wir [di afîşê de] Kurdî binivisîne an jî Tirkî binivîsîne, ger em dibêjin ‚ji jinê re azadî, dest nede bedena min‘ […] çi girîngiya wî heye, bi kîjan zimanî hatîye nivîsandin? Ji ber ku li wir [bi zimanê Kurdî dûrişme] nivisandîbû, hin kes [civînê] hiştin û çûn […]. (Kendirici Uğurman 2014: 23)[25]

Ji Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) Adalet Aydin mînakek weha ji bo bajarê Muğlayê dide:

> […]îmtîyaz û cudatîyên ku siyaset bi xwe re tîne hene […] em di nav tevgera xwe de ji bo azadîya ‚tevgera Kurd‘, ji bo ‚tekoşîna Kurd‘ tekoşînê didin, em girîngiyê didin zimanê zikmakî […]. Sîyaseta me ya esasî ye û em di çalakîyên jinan de wek mînak dibêjin „Jin Jiyan Azadî“ […] minak hinek jin li hemberî gotina „Jin Jiyan Azadî“ derketin. Ev ji çi ye? Ango dixwazin çi bibêjin? Bi zimanekî ku ez nizanim, lê belê yekî din baş dizane em dibejin „Jin Jiyan Azadî“, lê mixabîn ji ber ku siyaseta ew jê tê li dûrî „Tevgera Azadîya Kurd“ e, li hemberî vê slogana ku bi zimanê [Kurdî] tê avêtin disekine. Mînak ev pirsgirêkeke esasî ye. (Aydın 2015: 24)[26]

Ji aliyê hinek saziyên jinan ve bikaranîna zimanê Kurdî di çalakîyan de weki pênasekirina nasnameyeke polîtîk a Tevgera Jinên Kurd li Tirkiyê tê dîtin û ev yek nayê pêjirandin, ziman bi xwe û wateya wî ya sîyasî ku di vê çarçoveyê de lê hatiye barkirin jî tê red kirin. Cîhê ku Adalet Aydin bikaranîna zimanê Kurdî wekî mafekî bingehîn dest digire û diparêze, ji Komaleya Jinên

---

[25] „[…]Üç yıl önce kürtajla ilgili çok tartışmalar çıktı, orada yine […] elimizde afiş [leyiz]. Orada [afişte] Kürtçe yazsa ya da Türkçe yazsa, kadına özgürlük diyorsak, bedenime dokunma diyorsak […], hangi dilde yazıldığı önemli mi? Ama orada o [Kürtçe dilinde slogan] yazılı olduğu için bırakıp gidenler oldu, […].“

[26] „[…] Siyasetin getirdiği ayrıcalıklar, ayrılıklar var […]. Biz hareketimiz içinde ‚Kürt hareketinin‘ özgürlüğü için, ‚Kürt mücadelesi‘ için hareket eden insanlarız, anadile önem veririz […]. En temel politikamızdır ve biz kadın [eylemlerinde] ‚Jin Jiyan Azadî‘ diyoruz mesela ‚Kadın Yaşam Özgürlük‘ diyoruz. Mesela bu ‚Jin Jiyan Azadî‘ lafına karşı duran kadınlar çıkabildi. Bu neden? Yani aslında ne söyleniyor? Benim bilmediğim ama birisinin çok iyi bildiği bir dilden biz ‚Kadın Yaşam Özgürlük‘ diyoruz, ama onun geldiği siyasi yapı, ‚Kürt Özgürlük Mücadelesi‘ne mesafeli olduğu için, kadın için söylenmiş bu [slogana] o dilden [Kürtçe dilinde] söylendiği için karşı durabiliyor mesela. Bu mesela bir temel sıkıntıdır.“ (Aydın, 2015: 24)

Komarê ya bajarê Muğlayê Jale Eren bikaranîna Kurdî di çarçoveya nunertîye de digire dest û red dike:

> […]lê bele li vir Kurd di nav me de nîn in, lê dîsa jî divê em bi Kurdî binivisînin. […] bi rastî ev yek min tengasî dike. Ger wekhevî be, li gorî min hemû kes wekhev in. Ger li aliyekê tiştekî neyê kirin, dibê li alîyê din jî neyê kirin. Lê belê li wir tim bi yek alî hat axaftin. […] Di encamê de em digîhîjin cîhekê, lê di van mijaran de em lihev nakin. (Eren 2015: 24)[27]

Dema cîhe lekolînê, bajarên/heremên derveyî Diyarbekirê ber çav werin girtin, mijarên ku di bin sernivîsa „etnîsîte“ de tên dest girtin, li Enqerê bi awayekî saziyane (bi taybetî jî di platforman de û hwd. di nîqaşên ku di civînan de derdikevin holê de, di çalakîyan de) derdikevin pêş. Li Egeyê û Deryaya Reş jî li gorî tewna îdeolojîya bajêr (li gorî karektera bajêr a nijedperest) guhertin di nirxandina mijarê de xwe dide xuya kirin. Dîsa di vê çarçoveyê de xetereya peyveke li ser „pirsgirêka Kurd“ çawa mîna kiraseke ji agir sazîyen jinan û çalakvanan dikare di tengasîyê de bihêle, hate ziman. Tecrubeya ku Dîlek Buluta ji Komeleya Jinên Karyayê di hevpevîna xwe da anî zimên gotinên Kurdi/Kurd çawa di çarçoveyeke polîtîk de tên dest girtin bi awayekî balkêş datîne ber çavan:

> […] [Behsa bajarê Muğlayê tê kirin] nêzikatiya wê ya „pirsgirêka Kurd“ gelek hişk e. Mijareke li ser Kurdan, dixwazî bila mijara jinan be, mijarekî din be, hûn çiqas nerm jî biaxifin, bi çi awayî û çiqas bînin zimên jî, her gotina ku bi Kurd dest pê dike rastî nerazîbunan tê. Û li ser vî esasî li hemberî we propaganda tên kirin […]. (Bulut 2015: 9).[28]

Tecrubeyek hevbeş jî ji Mor Balık Fırat Varatyan ji bo Trabzonê dide:

---

[27] „[…] Ama burada Kürt yok içimizde ama biz Kürtçe yazmak zorundayız. […] Bunlar beni rahatsız ediyor açıkçası. Eğer eşitlikse, bence herkes eşit. Bir tarafa yapılmaması gereken bir şey varsa bu tarafa da yapılmaması gerekiyor. Ama bu hep tek taraflı olarak orada konuşuldu […] Sonuçta bir yere varıyoruz ama bu konularda anlaşamıyoruz.“

[28] „[…] [Muğla şehri kastedilerek] ‚Kürt meselesine‘ bakışı serttir. Kürtlerle ilgili herhangi bir konu, bu kadın meselesi olsun, başka bir konu olsun, söylem biçiminiz, söyleyişiniz ne kadar yumuşak olursa olsun, ya da ne kadar anlatmaya çalışırsanız, Kürt ile başlayan her konuda tepki yaşarsınız. Ve sizin üzerinizden propagandalar bunun üstünden yapılmaya başlanır […].“

> […] li vir, dema ku hûn behsa koka etnîkî bikin mesele diqede an jî tiştekî ku yekîtîya welêt [li gorî wan] bixe xetereyê [bi wan] bide fikirandin; dema ku hûn mentiqa Tirkbûnê, misilmanî yê an jî Tirkiyê-bûyînê xirab bikin, ka ew xaçên sor pir bi nav û deng in ya, ji wan yek datînin […] an jî bi rastî anatomîya bajêr vê yekê pewîst dike.(Varatyan 2015: 62)[29]

Akademîsyeneke aktîvîst ku ji bajarê Artvînê tevlî lêkolîna me bû, di hevpeyvîna xwe de qala bi çi awayî nêzikatiyeke germ a li hember „pirsgirêka Kurd“ ew kirine hedef û ev bi çi awayî buye sedema êrîşan, dike:

> […] ji ber ku em nayên gel hev, platform nameşe, hemû komeleyên Jinan bi serê xwe dixebitin. Wek mînak dikare te bike „ya din“, nehesibîne. Mînak ez û çend hevalen min, bi gotinên ku em sempatîzaniya Kurdan dikin, kirin hedef. […] Wekî mînak li cem Walî […] gotin „ev siyaseta Kurd dikin“, di rastîyê de tiştek, weha nîn e. (Anonim 2015: 35)[30]

1.5 Rexneyên li ser pêşaniya nasnameya Kurd

Serpîl Sancar di gotara xwe ya bi navê „çarçoveyên mafê tekoşînê yên jinan li Tirkiyê didin xuya kirin“ de (2006) nêzikbûn û armancên cuda yên tevgerên jinan ên cuda binav dike. Di vê çarçoveyê de pêşîktiya Tevgera Jinên Kurd wek ‚zimanê zikmakî, îşkence û binpêkirina mafên mirovan‘ dide xuya kirin. Li ser vî esasî ji ber ku rojeva Tevgera Jinên Kurd bi mijarên taybetî girêdayî Jinan ve ne bi sînor kiriye, xwedî rojeveke firehtir e, ji alîyê gelek çalakvanan ve tê rexne kirin. Nunera sazîyeke jin ji Enqerê di hevpêyvîna xwe de vê mijarê li ser jinên ku di nav „Partîya Aşitî û Demokrasîyê“ de cîhê xwe digirin, dinirxîne.[31] Li gorî wê jinên di nav „Partîya

[29] „[…] Burada etnik kökeni işin içine kattığınız an, olay bitiyor ya da ülkenin bütünlüğünü tehlikeye soktuğunu düşündürtecek bir şey; Türklük, Müslümanlık ve Türkiyecilik mantığını bozduğunuz an o kırmızı çarpılar meşhurdur ya, onlardan koyuyorlar bir tane […]. Ya da gerçekten şehrin anatomisi bunu gerektiriyor.“

[30] „[…] Çünkü bir araya gelemiyoruz, platform işlemiyor, bütün kadın dernekleri bireysel çalışıyor. Seni ötekileştirebiliyor mesela. Kürt sempatizanlığı yapıyorsun deyip, hedef haline getirdikleri de oldu beni, birkaç arkadaşımı. […] Valilikte mesela […] işte ‚bunlar Kürt siyaseti yapıyor‘ dendi, hâlbuki öyle bir şey yok.“

[31] Gelek sazî û dezgehên Jinan di nav Tevgera Jinên Kurd de cihê xwe digirin. Bi taybetî jî li bajar, bajarok û taxên Kurdan di bin sîwanên meclîsan de xwe bi rêxistin dikin, di heman demî da di nav partîyen siyasî (BDP HDP) de jî meclîsên Jinan hene. Li alîyê din li gelek bajarên Tirkiyê û Kurdistanê bi awayê rêxistinên sîvîl (Gökkuşağı, Selis, Kardelen hwd.) xwe birêxistin kirine.

Aşitî û Demokrasîyê” de cihê xwe digirin ne bîrdoziya Tevgera Jinan, lê ya xwe derdixînin pêş. Bi vî awayî li gorî wê, dibe ku tekoşîna li hemberî zayenda civakî bikeve dora duyemîn (Anonim, 2014: 37). Ji Navenda Komeleya Jinê *Yaşam*ê ya bajarê Trabzonê Nurber Gürdal jî bale dikişine ser civînên platforman, ku di civînan de berhevanînên „jinên Tirk û Kurd“ tên çêkirin, û ji ber vê yekê nerazîbûnên xwe tîne ziman (Gürdal 2015: 32). Dîsa ji Trabzonê ji rêveberiya „Femîn-Art“ê Şükran Üst, acisbuyîna xwe ya ku jinên Kurd di her platformê de behsa nasnameya xwe ya etnîkî dikin dike. Ew vê yekê yekane xala ku wan ji hev qut dike, dide nîşandan. Li gorî Üst Jinên Kurd bi binavkirina nasnameya xwe ya etnîkî ji xwe re pozîsîyoneke cuda çêdikin û behsa „cudakirina“ ji aliyê çep de dike (Üst 2015: 14).

Di hevpeyvînên li Diyarbekirê de, rexne li ser balkişandina nasnameya Kurd zêdetir li ser giranî dayîna nasnameya polîtîk û îdeolojîk a Tevgera Jinên Kurd hat kirin. Ji KAMER’ê Nebahat Akkoç ji ber ku Tevgera Jinên Kurd di hemû nêzikatîyên xwe de Abdullah Öcalan esas digire, li gorî wê, sazîyên jinan ên serbixwe nikare tevlî xwe û rojeva xwe bike (Akkoç 2015: 57). Dîsa li Diyarbekirê ji KESKESOR’ê Dilan Çiçek balê dikşîne ser piralîbûna mijarên Tevgera Jinên Kurd. Li gorî Çiçek tevgera jin her çiqas xurt be û xwedî înîsîyatîf be jî, carinan di nav Tevgera Kurd de wenda bibe (Çiçek 2015: 23).

Li Diyarbekirê di hevpevînên di derbarê vê mijarê de, li ser çalakîyên Tevgera Jinan û îhtîmala koalîsyonan de bandora heremê û pêvajoyên polîtîk de nezikatîyeke derket hole. Li gorî Mukkades Alataş Tevgera Jinên Kurd derveyî pirsgirêkên jinan pirsgirêka Kurd jî her çiqas zahmetîyen xwe hebin jî divê bigire dest û bi hev re bimeşîne:

> […] wek mînak em û sazîyeke ku li Stenbolê tekoşîna jinê dimeşîne ne wekhev in, ji ber ku em di heman demî de her toj tevlî cenazeyekî jî dibin. Neha li vir hevalên ku em bi hev re xebatê dikin, her yek ji wan di şer de mirovekî xwe wenda kirî ye, ev jî girîng e bê guman. Hûn li vir tenê xebatekê ji bo jinê nameşînin, li hemberî sîstemê jî têdikoşin, di heman demî de tekoşîna tevgera azadiyê jî dimeşînin, hemû pir bi hev re girêdayî ne. Ji ber

> vê gelek jî tehdeyî heye […] li ba me cudabûna beşan nîn e. (Alataş 2015: 13)[32]

Ji Hebûnê Arîf û aktîvîstên din jî bi awayekî hevbeş balê dikişînin ser cudabûna pêwîstî-„yên li vir û yên li wir“:[33]

> […] lê belê li Rojavayê Tirkiyê dîtina jineke siyasî, […] jineke mîlîtan tune ye. Li vir ew heye. Ango ez bahsa jineke gerîla dikim an jî mîlîtaneke li bajêr dikim. Ji ber ku mîlîtanbûn ne tenê di dest de çek [hebûn e]. Mîlîtanên bajêr jî hene. Ez bawer dikim xalên ku ji hev cuda dibin ev in, pêwîstî û pirsgirêkên vir û yên wê derê ne yêk in mixabin. Dibe ku ev yêk, ji hev cudabûna navbera Stenbol û Diyarbekirê kêm zêde bala te jî [behsa lêkolînvanan dike] kişandibe. (Arif û yên din 2015: 46).[34]

Bi dîtina *yên derve* rojeva Tevgera Jinên Kurd zêdetir bi nêzikatîya wê ya li ser esasa pirsgirêka Kurd tê nirxandin, lê aktîvîstên Tevgera Jinên Kurd qada xwe ya esasî wek „tekoşîna li hemberî zilam û sîstema baviksalarî“ (Alataş 2015: 19) binav dikin. Tekîlîyên xwe yên bi tevgera jinên Tirkiyê re jî, zedetirî di platformên cuda de li ser esasa destgirtina wan a „dewlet û tundiya zilam“ dinirxînin. Mukkades Alataş vê yêkê bi mînakekî şênber dike:

> Mînak dema ku di platforma tekoşîna hemberî tundiyê de em dibejin ‚hevalno li heremê sistema sixuriyê heye û sîstema sîxuriyê li hemberî jinê tundiyê çêdike. Ji bo ku sîxurî, […] hêzeke çekdarî ye, destê wan de çekên wan hene û bê konrol in, […] li hemberî hevjînên xwe jî şîdetê bikar tînin û li ser Jinan desthilatdarîyeke gelek cidî li dardixin. Lewma jî bi giranî li ser jinên nêzî xwe, jinên nav malbata xwe, ne li hemberî jinên din [vê şîdetê bi kar

---

32 „[…] Mesela İstanbul'da bir kadın mücadelesi yürüten bir kurumla biz aynı değiliz; çünkü biz her gün bir cenazeye katılıyoruz aynı zamanda. İşte burada birlikte çalıştığımız hemen hemen her arkadaş bu savaşta bir yakınını kaybetmiş, bu da çok önemli tabii ki. Yani buralarda sadece kadın çalışması yürütmüyorsunuz, aynı zamanda işte sisteme karşı bir mücadele yürütüyorsunuz, aynı zamanda işte ‚Kürt Özgürlük Mücadelesi'ni‘ yürütüyorsunuz, hepsi çok birbirine bağlı. Dolayısıyla çok ciddi yıpranmışlık da oluyor […] alan ayrışması yoktur bizde.“

33 „burasıyla orası“

34 „[…] Ama Batıda siyasi bir kadın, […] militan kadın anlayışı yok. Burada bu var, militan kadın anlayışı var. Yani dağdaki gerilla kadınlardan bahsediyorum, ya da işte şehir militanlarından bahsediyorum. Çünkü bir militan olmak sadece elinde silah [olması değildir]. Şehir militanları da var. Ayrıldıkları nokta bence bu; çünkü buranın ihtiyaçları ve sorunlarıyla oranın ihtiyaçları, sorunları bir değil maalesef. Hani bunu [araştırmacıları kastediyor] sen de az buçuk gözlemlemişsindir belki İstanbul'la Diyarbakir arasındaki farkları.“

> tînin]. Ji ber vê yekê divê sistema sîxuriyê were rakirin.‘ Piranîyê jinên Tirkiyê ku bi me re di wê platformê de cîhê xwe digirrin gotin: ‚Ev ne pirsgirêka me ye.‘ Nexwestin ku sîstema sîxuriyê rabe. […] Neha li vir perspektîfekê jinê tune ye. Ger jinek sîstema sîxuriyê biparêze ew jin ne xwedî bergeha jinê ye. Di vir de xalê ku em lihev nakin hene, mesela mirov dikare van weke mînak bide, gelek mînakên balkêş in. (Alataş 2015: 23)[35]

Her çiqas mînaka balkêş a Mukkaddes Alataş ku li ser sîstema sîxuriyê tîne ziman, di tekoşîna mafên jinan de guhertina mercên civakî li gorî hereman çawa cuda dibin, bîne berçav jî, Tevgera Jinên Kurd tekoşîna li hemberî zîhniyeta baviksalarî, wek mijareke heremî an jî tenê jibo hin beşî nagire dest. Ji Akademîya Jinan a bajarê Diyarbekirê Figen Aras dest nişan dike ku ew dixwazin zanebûna zayendê derxînin holê, bi tekoşîna hemberî sîstema baviksalarî dixwazin di zîhniyetê da şoreşekê çêkin (Aras 2015: 2). Sara Aktaş jî mina Fîgen Aras balê dikişine ser rola ji sîstemê qutbûnê, ku li gorî wê Tevgera Jinên Kurd qutbuyînekî radîkal esas digire, û di wê baweriyê de ye ku ew „tekoşîneke hîn pirtir îdeolojîk“[36] dimeşînin:

> Lê belê di heman demî de li Tirkiyê gelek rêxistinên Jinan ên ku ji bo azadiya jinê tekoşînê didin hene. Dibe ku ew [mijarê] wekî me bi awayekî radîkal nagirin dest, an jî […] teorîya qutbûne, îdeolojiya rizgarbuyîna jine, di rastîyê da ji şaristaniyê, ji sîstem û ji zîhnîyeta zilam bi tevahî qutbuyînê nagirin dest. Dibe ku perspektifa wan a çareserîyê perspektîfekî ku çareserîyê hinekî di nava sistemê de digere an jî […] perspektîfa wan a çareserîye zêdetir li ser esasa wekhevbuyîna jin û zilam e. (Aktaş 2015: 13)[37]

---

35 „Örneğin, Şiddetle Mücadele Platformu'nda ‚Arkadaşlar, bölgede koruculuk sistemi vardır ve bu koruculuk sistemi kadına şiddet üretiyor. Çünkü korucular, […] bir silahlı güçtür, elinde silahları vardır, denetimsizlerdir.[…] Eşlerine şiddet uygularlar, kadınlar üzerinde çok ciddi hakimiyet kurmuşlardır. Dolayısıyla daha çok kendi yakınındaki kadınlar, aile içerisindeki kadınlar, başka kadınlar değil. Bunun için koruculuk sisteminin kaldırılması gerekiyor‘ dediğimizde, aynı platformda olduğumuz Türkiyeli kadınların birçoğu dedi ki: ‚Bu bizim sorunumuz değil.‘ Koruculuk sisteminin kaldırılmasını istemediler. […] Şimdi burada bir kadın bakış açısı yok. Koruculuk sistemini destekleyen bir kadın varsa, bu kadın bakış açısına sahip değildir. Burada mesela uyuşmadığımız noktalar vardır, mesela bunlar örnek verilebilir, çok önemli örneklerdir.“

36 „çok daha ideolojik bir mücadele“

37 „Ama aynı biçimde yine kadın özgürlüğü için mücadele eden birçok kadın örgütü vardır Türkiye'de. Belki onlar [meseleyi] bizim kadar radikal temellerde ele almıyorlar, ya da […] kopuş teorisini, kadın kurtuluş ideolojisinin gerçekten uygarlıktan, sistemden ve erkek aklından tamamen bir kopuş olarak ele almıyorlar. Belki onların çözüm perspektifleri biraz daha sistem içinde bir çözüm perspektifi ya da […] biraz daha erkekle kadının […] eşitlenmesi üzerine çözüm perspektifleri olabiliyor.“

1.6 Tecrubeya tekoşînekê ku mînak tê girtin

Mîna ku li jor jî hat nirxandin, Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê derveyî çarçoveya îdeolojîk, pêdivî û rastîyên civakê jî digire rojeva xwe. Ev yêk di bin hin sernivîsan de bû mijarên ji hev veqetînê – etnîkî, îdeolojîya cuda, pirsgirêka Kurd – ji hêla din şewqa van nîqaşan di nav tevgerên jinan ên Tirkiyê de cuda cuda bû. Li ser vê mijarê piranîyen beşdarvanan gîhîştin wê encamê ku tecrubeya Tevgera Jinên Kurd gelek girîng e, ji ber ku Tevgera Jinên Kurd tekoşîna xwe tenê bi mijara civaka zayendî ve bi sînor nake, xwedî hêzeke dînamîk e, ku wê ji civakê digire û bi vê hêzê dikare civakê biguhere.

Çalakvaneke ji Komeleya Jinan Karyayê ya bajarê Muğlayê balê dikşîne ser hêza wê û dibêje Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê ji bo tevgerên jinan ên din çavkaniya hêz û îlhamê ye:

> Neha li Tirkiyê her tişt li ser Tevgera Jinên Kurd de dimeşe. Nizanim bala we kişand, li tevahîya Tirkiyê taybetî Enqerê, Stenbol, Diyarbekir, […] Îzmîr jî tê de piranîyên tevgerên jinan li ser tevgera [jinên] Kurdan dimeşe […].
> (Anonim 2015: 33)[38]

Ji KAOS GL a bajarê Enqerê Seçin Tuncel pirsa „Bi dîtina we tevgerên jinan an jî tevgera jin çi ye?“ bi bersîva xwe ya „dema dibêjin tevgera jin, […] ji çî ye nizanim, ‚Tevgera Jinên Kurd‘ tê bîra min“ (Tuncel 2014: 20),[39] ji hêlekê de – wekî hemî beşdarvanên din – Tevgera Jinên Kurd wek tevgereke resen dibîne û balê dikşîne ser hêza wê ya rêxistinî xuyabûna wê ya wek tevgereke jin. Selen Doğan Tevgera Jinên Kurd bi rola wê ya di tekoşîna mafên Jinan de û bi tecrubeya xwe ya ku tevlî tekoşîna mafên mirovan û azadiyê kiriye, Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê wek aktoreke gelekî girîng dinirxîne (Doğan 2014:30). Li gorî wê jinên Kurd „tekoşînê ji cîhekê din de avakirinê“ dane hîn kirin. Li gorî nirxandina Handan Çağlayan „tecrube û modela ku wan derxistiye holê ji bo tevahî tevgerên jinan ên li Tirkiyê û yên welatên din gelek balkêş e.“ (Çağlayan 2 014: 30)[40] Ji Komeleya Karmendên Jinên Ciwan a Denizliyê (GİKAD) Ayşe

[38] „Şu anda Türkiye'de her şey ‚Kürt Kadın Hareketi‘ üzerinden yürüyor. Bilmiyorum dikkatinizi çekti mi, bütün Türkiye'de özellikle Ankara, İstanbul, Diyarbakir, […] İzmir dahil birçok kadın hareketi ‚Kürt [Kadın] Hareketi‘ üzerinden yürüyor […].“
[39] „Kadın hareketi deyince […] ‚Kürt Kadın Hareketi‘ aklıma geliyor niyeyse.“
[40] „ortaya çıkardıkları deneyimin, modellerin genel olarak Türkiye'deki ve diğer ülkelerdeki kadınlar açısından da dikkate değer örnekler“

Balkanay, balê dikişîne ser karektera Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê ya „rikgirt û berxwedêr“ û xîreta wan a ku li her deverên ku lê ne, sîyaseta xwe diparêzin:

> Dibe ku [resentîya] tevgera jinan a rojhilat e, berxwedêrbûna wan, rikgirtina wan ji berê de tê, an jî li hemberî hin tiştên berçav rikgirtina wan heye. Ji bo vê him li hemberî feodalîzmê him jî li hemberî zordestîye [...] tirûşdar in û bi rik li her derê hene û li her deverê heman tiştî dixwazin bînin ziman. (Balkanay 2015: 36)[41]

Ji Kluba Soroptimist a bajarê Denizliyê Julîde Keleş-Yarışan hêza Tevgera Jinên Kurd bi civakbûna wê ve gire dide:

> [...]ya tevgera jin [...] di encamê de tevgereke jin a Kurdan heye, şerê ku ew li wir didin cudatir e. Zêdetir li hemberî sîstemê ye. Dibe ku di nav malbatê de û [...] di nav jîyana civakê de [pirsgirêka jin] hîn resen hest dikin, lewre jî tevgera li wir bi hêztir e.(Keleş- Yarışan 2015: 16)[42]

1.7 Li şûna Paşgotinê

Bi giştî li hemberî buyerên civakî û sîyasî bertek dayîn, xwe muxatap dîtin û rewşa mudaxîl buyînê di piranîya tevgerên jinan ên Tirkiyê de bû refleksekê ji rêzê. Li gorî hevpeyvînan Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê, di tekoşîna mafên Jinan a piralî de destpêkê mijarên ku li ser kûr buye bigire, bi sekna xwe ya sîyasî û îdeolojîk û daxwaza nasnameyî, wek tevgereke jin ku vê refleksê ya herî bi hêz nîşan dide û rêxistin dike, derdikeve pêş.

Di lêkolîna me de, pozîsyona ku Tevgera Jinên Kurd li Tirkiyê ji tevgerên jinên din cuda dike bi „sekna îdeolojîk û sîyaseta ku dimeşîne“ tê pênase kirin. Ev yek wek xalekî hevbeş him ji hêla aktîvîstên ku di nava Tevgera Jinên Kurd de cîh digirin û him jî aktîvîstên derveyî Tevgerê Jinên

[41] „Belki Doğu'daki kadın hareketinin [özgünlüğü] çok daha dirençli olması, onların inadının daha önceden geliyor olması veya çok daha görünür bir takım şeylere karşı inatlarının olabilmesindendir. İşte hem feodaliteye, hem oradaki birtakım baskılara filan [...] çok dirençliler ve inatla her yerde varlar ve her yerde aynı şeyi söylemeye çalışıyorlar.“

[42] „[...] Kadın hareketinin [...] -Kürtlerin bir kadın hareketi var neticede- onların verdiği savaşım daha farklı orada. Daha sisteme dönük. Belki çok daha net hissediyorlar aile içinde ve [...] toplumsal yaşantının içinde [kadın meselesini], daha güçlü o yüzden de oradaki hareket.“

Kurd ve hat nirxandin. Her çiqas rexneyên pêvajoya pêşketinên dîrokî li hember femînîstên Tirk wek dînamîka bingehîn a vê „pozîsyona cuda“ bê dest girtin jî, di pêvajoya pêşketina Tevgera Jinên Kurd de tekîlîyên wê ya bi tevgerên jinên din ên Tirkiyê re – mîna ku di çarçoveya vê lêkolînê de jî derdikeve hole – mijarên di çarçoveya etnîsîteyê de hatin dest girtin, wekî mijarên veqetînê herdem bûne sedema rageşîyan.

Di çarçoveya projeya ve lêkolînê de ku tevgerên jinên Tirkiyê li bajarên cuda ruberîhev dike, dikare bê ku Tevgera Jinên Kurd li herem û bajarên ku lêkolîn lê çebûne, hin caran wek aktoreke xurt ku pê re hevkarî tê kirin, hin caran jî jê tê cihê kirin, derdikeve pêş. Her çiqas bi taybetî mijarên „nasnameya etnik“ û „zimane zikmakî“ cîhê ku lêkolîn lê hatîne çêkirin, bûbin mijarên dêrîniyê jî, di mijarên civaka zayendî û tekoşîna mafên jinan de behsa nêzikbuyînê û hevbeşîyê dikare bê kirin.

Her çiqas Tevgera Jinên Kurd ligel tekoşîna civaka zayendî siyaseta girêdayî nasnameya etnîkî bimeşîne û ev mijar di nav tevgerên jinan de bibe mijara nîqaşê jî, ji alîyê gelek aktîvîst û akademîsyenan ve ev yek sedema dînamîka xurt ku vê sekna polîtîk derdixîne holê, tê dest nişan kirin. Bandora Tevgera Jinên Kurd a Tirkiyê ku bi herema Kurdan ve bisînorkirî namîne û daxwazên xwe yên ji bo civaka zayendî û tekoşîna polîtîk li hemû deverên ku lê bi rêxistinkiriye bi rik tîne ziman, bandorekî mezin li ser pêvajoya afirandina baldarîye çê dike. Dîyarkirin û tespîtên heta neha hatine veguhestin, di heman demî de bi giştî di çarçoveya vê lêkolînê de û di gotinên derbarê Tevgere Jinên Kurd de encama derketiye holê ev e: Ev pevajoya ku mirov dikare wek pevajoya têgihiştin û hevdu qebûl kirinê binirxîne, mesafeya navbera „em û ew“ û sedemên vê yekê kir mijara axaftinê.

Çavkanî

- Açık, Necla (2003) „Die Kurdiche Frauenbewegung in der Türkei“, Bonn: NAVEND - Zentrum für Kurdische Studien e.V. (Ed.), 131-152.
- Açık, Necla (2004) *Nationaler Kampf, Frauenmytos und Frauenmobilisierung: Eine Analyse zeitgenössischer Kurdischer Frauenzeitschreiften aus der Türkei*. Di nav: Hajo; Siamend/Borck, Carsten/Savelsberg, Eva/Doğan, Şükriye (Ed.) Gender in Kurdistan und der Diaspora, Münster: Unrast, 125-158.
- Al-Rebolz, Anıl (2012) *Das Ringen um die Zivilgesellschaft in der Türkei-* Intellektuelle Diskurse, *oppositionelle Gruppen und Soziale Bewegungen seit 1980*. Bielefeld: Transkript.
- Crehan, Kate (2002) Gramsci, *Culture and Anthropology.* London: Plutobooks, 98-162.
- Çağlayan, Handan (2007) *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar- Kürt Hareketinde Kadınlar ve Kadın Kimliğinin Oluşumu*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Sancar, Serpil (2006) „Türkiye'de Kadınların Hak Mücadelesini Belirleyen Bağlamlar“, http://panel.stgm.org.tr/vera/app/var/files/t/u/turkiyede-kadinlarin-hak-mucadelesi-serpil-sancar.pdf, dîroka daxistinê: 18.12.2016.
- Spivak, Gayatri Chakravorty (2008) *Can the subaltern speak? Postkolonialität und subalterne Artikulation*. Wien: Turia+Kant.
- Strohmeier, Martin/Yalçın-Heckmann, Lale (2000): *Die Kurden. Geschichte*, *Politik, Kultur* München: C.H. Beck.
- Yalçın-Heckman, Lale (1999): Kürt Kadınlarının İmajı- Bazı Eleştirel Değerlendirmeler, *http://www.birikimdergisi.com/birikim-yazi/2861/kurt-kadinlarinin-imaji-bazi-elestirel-degerlendirmeler*, dîroka daxistinê: 19.01.2017.